Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :848 21-Adar- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 848 21-Adar- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

21`ê Adarê roja serkeftin, vejîn û azadiya Kurdan e

Ji ber ku gelê Kurd 21 Adarê wek vejîn dibîne, her sal li seransrê Kurdistanê gelê Kurd cejna newrozê bi girseyî pîroz dike. Rêveberê Saziya Malbatên Şehîdan Îsam Îbrahîm diyar kir ku Newroza 2021ê bi serkeftina Garê desî pê kir û wê bi azadiya rêber Apo bi dawî bibe. *R6*

Bi deh hezaran şêniyên Efrînê soza rizgarkirin Efrînê nû kirin

Bi deh hezaran koçberên Efrînê û şêniyên kantona Şehbayê soza berxwedan û têkoşîna heta rizgarkirina Efrînê dan.

Bi pêmana salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê ji hêla artêşa tirkî ve, bi durişma "Bi ruhê berxwedana Garê û Serdemê emê Efrînê rizgar bikin" Meclisa kantona Efrînêli meşeke girseyî li dar xist. Ji bo tevlîbûna meşê bi dehhezaran Kurd, Ereb, Tirkmen, ji tevayiya navçe û gundewarê Şehba û navçeya Şêrawa, li ser riya di navbera bajarokê Babins û navçeya Fafinê de kom bûn.

Meşê bi durişmên silavkirina berxweddana Serdem, Garê û Heftenînê û şermezarkirina bêdengiya navneteweyî li hemberî sûcên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên li Efrînê, dest pê kir.

Meş li Dibistana Ajokariyê ya navçeya Fafînê vegeriya mîtîngê. Di mitîngê de Endama Rêveber ya Kongreya Star ya Herêma Efrînê Hediye Yûsiv tevî hildana çiqilê zeytûnê axivî û wiha got: "Îro û piştî derbasbûna 3 salan di ser dagîrkirina Efrînê re bêdengiyeke navneteweyî heye û em vê bêdengiyê şermezar dikin. Lewre bêdengî dikeve xizmeta dewletên kapîtalîst."

Hediye Yûsiv axaftina xwe wiha domand: "Piştî ku dewleta tirkî berxwedana me ya li hemberî xwe nas kir û li Garê û Heftenînê şkest, derbarê rêber Abdullah Ocalan de nûçeyên neçê belav kirin."

Dûv re Serokê Partiya Sûriya Paşrojê Îbrahîm Qeftan wiha axivî: "Çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker yên xiyanet li şoreşa xwe kirîn û bûyîn dûvikê dewleta tirkî, niha di destê dewleta tirkî de ji bo kuştina welatiyan û derbkirina projeya neteweya demokratîk yaa

bi armanca hewldana yekkirina gelên Sûriyê amûr in."

Mitîng bi durişmên silavkirina berxwedanê bi dawî bû.

"Rêber Apo hevalê me zarokan e"

Navenda nûçeyan/Qamişlo

Ji bo agahîgirtin ya rewşa tenduristiya rêber Abdullah Ocalan, Qomîteya Zarokan Qada Civakî ya Kongreya Star (19.03.2021) saet 11an li bajarê Qamişlo meşa zarokan li dar xist. Meşê ji Parka Helebça dest pê kir û heta navenda Neteweyên Yekbûyî (Ny)ê dewam kir. Di meşê de jî zarokan daxwiyaniye dan.

Daxwiyanî wiha ye: Em zarokên Rojava di serî de Newroza Rêber Abdullah Ocalan û gelê Kurd pîroz dikin. Ji bo zarok azad bijîn Rêber Apo ji zaroktiya xwe de heta roja me ya îro berxwedanîyê dike. rêber Apo hevalê me zaroka ne. rêber Ocalan dibêje bi xeyalên xwe yên zarokatiyê min îxanet nekiriye, em zarok jî, wê bi xeyalên rêbertî ve

girêdayî bin û emê jiyanek azad biafirînin. Tenduristiya Rêber Apo ji bo zarokên Kurdistanê hemî pir giringe. Daxwaziya me ewe ku em rêberê xwe azad bibînin."

Meş bi gotina "Bê serok jiyan nabe" qediya

Dewleta tirkî ava çemê Qeremoxê birî

Dewleta tirkî ya dagîrker sûcekî din yê şer kir û ava çemê Qeremoxê yê di Kobanê re derbas dibe birî. Dewleta tirkî herwiha bombe li gundekî Efrînê barandin.

Li gorî agahiyên hatîn bidestxistin, çeteyên bi navê Feyleq El Mecîd yên girêdayî rejima Enqere, ava çemê Qereboxê yê di erdê Kobanê re derbas dibe, birî ku çotkar zeviyên xwe bi ava vî çemê av didin.

Ji ber ku çavkaniya avê ya yekane ya cotkaran e, ev çem gelek girîng e. Dewleta tirkî di şerê xwe yê li dijî

bakur û rojhilatê Sûriyeyê de avê her tim weke çekekê bi kar tîne.

GUNDEKÎ EFRÎNÊ HAT BOMBEKIRIN

Li aliyê din hat ragihandin ku gundê Soxaneke yê Efrînê hatiye bombekirin. Li ser êrişê agahiyên berfireh nehatin girtin.

Li Kobanê, Tebqa û Qamişlo şehîd bi merasiman hatin veşarin

Bi merasimên girseyî li Kobanê, Tebqa û Qamişlo bi tevlîbûna bi sedan kesî cenazeyê şervanên QSD'ê Ebdullah El Elî, Xalid El-Meter, Gerîla Helinc û cenazeyê endamê Hêzên Ewlekariya Hundir Mihemed Tahir Osman li goristanên şehîdan spartin axê.

KOBANÊ

Bi sedan şêniyên Kobanê cenazeyê şervanê QSD'ê Çiya Ehmed bi nasnav Gerîla Helinc bi merasimekê girêseyî li Goristana Şehîd Dîcle spartin axê.

Di merasimê de endamê Desteya Rêveber ya PYD'ê ya Herêma Firatê Ehmed Şêxo sersaxî ji malbata şehîd re xwest û got: "Her mirov dixwaze bi rûmet bijî, ji ber wê divê ji bo wê berdêl bên dayîn. Mînaka herî nêz şerê li Kobanê û goristana Şehîd Dicle ye ya ev şehîd himbêz kirîn."

Di merasîmê de endama Koordînasyona Kongreya Star ya Herêma Firatê Macîda Hesûn jî sersaxî ji malbatê re xwest û bang li gelên herêmê kir ku li hemberî planên dijmin yên qirkirin û şerê taybet yekîtiya xwe çêkin û xeta şehîdan bişopînin.

Piştî axaftinan, cenazeyê şehîd Ehmed di nava durişman de hat veşartin.

TEBQA

Bi sedan şêniyên herêma Tebqa cenazeyê şervanên QSD'ê Ebdullah El-Elî û Xalid El-Meter yên 13'ê Adara 2021'ê de di êrişa çeteyên DAIŞ'ê de şehîd bûyîn, li Goristana Şehîdên Tebqa spartin axê.

Di merasima li goristanê de bi navê Meclisa Malbatên Şehîdan, Meclisa Leşkerî ya Tebqa û Meclisa Sîvîl ya Tebqa axaftin hatin kirin. Di axaftinan de sersaxî ji malbatên şehîdan re hat xwestin û soza şopandina xeta şehîdan ta pêkanîna serkeftinê hat dayîn. Cenazeyê her du şehîdan di nava tiflîliyên dayîkan û durişmên "Şehîd namirin" de hatin veşartin.

Qamişlo

Bi sedan şêniyên bajarê Qamişlo cenazeyê endamê Hêzên Ewlekariya Hundir şehîd Mihemed Tahêr Osman ku ji ber nexweşiya dil

şehîd bûbû, li Goristana Şehîd Delîl Saroxan spartin axê.

Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya kantona Qamişlo Elî Omer di merasimê axivî û diyar kir ku gelên bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî dîrokeke tijî serkeftin in, bi hezaran ciwan ji bo parastina van destkeftiyan canê xwe feda dikin.

Piştre bi navê Hêzên Ewlekariya Hundir fermandar Bahoz Elî sarsaxî ji malbata şehîd re xwest û got: "Gelê bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo avakirina îradeyeke xurt her tim li ber xwe dide."

Piştî axaftinan bi tiflîliyên dayîkan û durişmên silavkirina şehîdan, cenazeyê şehîd Mihemed Tahêr Osman spartin axê.

ANHA

Li Tirbespiyê û Qamişlo şehîdên Adarê hatin bîranîn

Şêniyên navçeya Tirbespiyê û bajarê Qamişlo şehîdên meha Adarê bi merasiman bîr anîn.

Meclisa Malbatên Şehîdan merasima bîranîna şehîdên Adarê li hola Siyahî ya navçeya Tirbespiyê ya Qamişlo bi beşdariya bi sedan welatiyan û malbatên şehîdan li dar xist.

Di merasimê de malbatên şehîdan find pê xistin û kulîlk danîn gel wesîqeyên şehîdan. Dûv re li ser ked, têkoşîna şehîdan û şehîdên komkuiya Helebce sînevizyonek hat pêşandan.

Pişt re hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Enwer Muslim axivî û diyar kir ku gelên herêmê di tevahî cureyên kuştin û koçberiyê re derbas bûn, tenê ji ber ku banga azadiyê kirin.

Muslim qurbanên komkujiya Helebce jî bîr anîn û got, komkujiya li Helebce bi destê rejima Baasê pêk hatiye. Niha bi destê AKP'ê li bakurê Kurdistanê digel bêdengiya navneteweyî û herêmî dubare dibe.

Piştî axaftinê, wesîqeyên şehîdan hatin xwendin û radestî malbatên wan hatin kirin.

Li Qamişlo jî, Meclisa Malbatên Şehîdan 94 şehîdên meha Adarê ku li herêm û dîrokên cihêreng şehîd bûne, li Goristana Şehîd Delîl Sarûxan bi merasimekê bîr anîn.

Di merasimê de hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Herêma Cizîrê Hesen Ubeyd li ser rola şehîdan û keda wan ya di parastina welat de axivî.

Ubeyd diyar kir ku ti gotin nînin ku cihê şehîdan yên ku ciwantiya xwe bê dudilî ji bo welat dane, pênase bikin. Ji ber wê şopandina rêça şehîdan li ser milê me ye, da ku armancên ku ji bo şehîd bûbûn de, pêk bînin.

Pişt re Meclisa Malbatên Şehîdan wesîqeyên şehîdan xwendin û radestî malbatên wan kirin.

ANHA

Newroz Roja Teqezkirina Soza Azadiyê Ye

Idrîs Henan

Zêdetirî 350 endamên komên cuda yên Tev-Çandê ya Herêma Efrînê wê beşdarî şahiya newroza 2021'an a li Şehbayê bibin. 6 komên stran û mûzîkê, 3 skêçên şanoyê, 3 tabloyên govendê û mêvanên taybet wê li ser dika şahiyê hunerên xwe pêşkêş bikin. Mezintirîn tabloya govendê ku ji 72 endamên Koma Çiyayê Kurmênc pêk tê, wê li ser sehneya newroza 2021'an banga yekîtiya neteweyî, rizgarkirina Efrînê û azadkirina Rêber Apo bike.

ASTENGÎ BI VÎNA KAWA Û MAZLOMAN TÊN DERBASKIRIN

Di vê derbarê de Endamê Rêveberiya Tev-Çandê li Herêma Efrînê Rêzan Berkir ji rojnameya Ronahî re axivî. Bekir got: "Ev çend mehin bi moral û coşek mezin amadekariyên

newrozê têne kirin. Ji sê mehan û li vir hemû komên hunerî di nava perwerdê de ne. Hemû astengiyên ku bi dorpêça li ser herêma Şehbayê hatin afirandîn, bi vîna Kawa û Mazloman hatine derbaskirin. Em xwedî îradeya rizgarkirina Efrînê û azadkirina Rêber Apo ne."

Bekir bal kişand ser girîngiya newroza îsal û bi bîr xist ku newroza 2021'an du newrozan dihewîne nava xwe û wiha got: "Gelê me derbasî çaremîn sala dagirkirina Efrînê dibe. Bi newrozan re bendewarî û hêviyên xwe pratîze dike. Ji bo me Kurdan rojeke derbirîn û teqezkirina berxwedanê ye."

HER KES BI RENGÊ ÇANDA XWE TEVLÎ NEWROZÊ DIBE

Li gor agahîyên Rêzan Bekir wê 6 komên stran û mûzîkê 'Koma Çiyayê Kurmênc 30 endam, Koma Kevneşopî 10 endam, Koma Hunermendên Efrînê 8 endam, Koma Kevana Zêrîn 12 endam, Koma Komeleya Êzîdî 12 endam, Koma Pêkhateya Ereb-Şehba 14 endam' komek Şano wê çend skêçan pêşkêş bike, 3 komên govend û mêvanên ji derve wê tevlî şahiya îsal bin. Bekir da zanîn ku wê 5 kom û hunermendên Efrînê beşdarî şahiya Kobanê û Minbicê bibin û got; "wê her kes bi rengê çanda xwe beşdarî şahiya newroza 2021'an be."

Endamê Rêveberiya Tev-çandê li Herêma Efrînê Rêzan Bekir di dawiyê de tekez kir ku nameya wan ya îsal 'yekîtiya gelê Kurd, rizgarkirina Efrîn û hemû herêmên hatine dagirkirin û azadkirina Rêber Apo' ye.

ARMANC JIYANA KOLEKTÎF E

Berdevka girûpên mûzîk û stranan ya li navenda Tev-Çandê Newroz Silêman jî ji rojnameya me re axivî û di derbarê amadekariyên wê beşê de agahî wiha bi me re parve kirin; "Endamên koman, li gorî komîteyek taybet ji hemû deverên Şehba û Efrînê hatine hilbijartin. Komên me dê li gorî navê xwe bi awayekî rêkûpêk wê

tevlî şahiyê bibin. Armanca me teqezkirina destgirtin û jiyana kolektîf e. Hemû kom jî bi erka parastina çandî derdikevin ser dika newrozê. Gotin û awazên me jî li ser sê lingên sereke; rizgarkirina axê, şehîd û azadiya Rêber Apo hatine daraştin."

NEWROZ BÊ ŞANO NABE

Şanoger û Endamê Mamosteyên Komîteya Komîna Şano yê li Herêma Efrînê Selam Îbo jî bal kişand ser amadekariyên aktivîstên şanoyê û wiha got: "hunera şano navgîna rasterast a bi civakê re ye. Di van

sê salên koçberiya li Şehbayê de, heta radeyek baş me kariye êş, azar û berxwedana gelê Efrînê biteyisandiba. Ji lew re, weke kevneşopî ne gengaz e newroz bê şano bin. Ji ber vê jî bi qasî 50 endamên Komîna Şano di nava amadekariyên newrozê de ne. Em ê bi du skêtçên ku tracediyên nezanîn û berpirsiyartiyê vedibêjin, beşdarî şahiya îsal bin".

BI 72 GOVENDA BERSIVA 72 BALIFIRÊN FAŞÎZMÊ DIDIN

Endamê Rêveberiya beşa govendê li navenda Tev-Çandê li Herêma Efrînê Hemûdê Dawûd jî ji me re axivî û ev tişt anî ziman; "parastina kelepûr, adet û fulkorê misyonek me yê bingehîn e. Tabloyên govendê di cewherê xwe de bangewaziyên yekîtiyê ne. Çiqas rengên govendê hebin jî, bi mildan û destgirtinê guncaw dibin"

Dawûd di dawiyê de li ser tabloyên di newroza 2021'an de bêne pêşkêşkirin jî ev agahî par

ve kirin; "em ê bi sê tabloyan; Koma Kevneşopî, Koma Şehba û Koma Çiyayê Kurmênc beşdarî newrozê bibin. Di tabloyên me de çanda çar beşên Kurdistanê tê vegotin. Lê ya herî girîng ew e ku koma Çiyayê Kurmênc, tabloyek ji 72 kesan pêk tê, wê pêşkêş bike. Ew jî vegotina jimara balefirên ku êrişî Efrînê kirine ye. Di vê tabloyê de banga yekîtiyê neteweyî tê kirin ku 'ger em yek bana, faşizma tirk nediwêrî 72 balefirên xwe bi ser me de rake'."

Hêjayî gotinê ye ku roja Înê 19 Adara 2021'an dê şahiyek taybet ji zarokên Efrîn û Şehbayê re li kampa Berxwedan wê bê lidarxistin. Di vê şahiyê de wê hemû çalakiyên hunerî; govend, şano û stran bi beşdarbûna komên zarokan bêne lidarxistin.

Xwendekarên zanîngeha Rojava, salvegera dagîrkirina Efrînê bi tabloyan bîr anîn

Bi pêmana salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê Zanîngeha Rojava beşa Hûnerên Bedew, li pêşiya baxçeyê Gel yê li bajarê Qamişlo tabloyên hûnerî yên êşa Efrînê diyar dikin, nîşan dan.

YPG û YPJ`ê li dijî êrişên artêşa tirkî ya dagîrker 58 rojan li ber xwe dan, lê ji ber êrişên

artêşa tirkî yên hovane 18`ê Adara 2018`an bajarê Efrînê hat dagîrkirin.

Bi pêmana salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê, Zanîngeha Rojava beşa Hûnerên Bedew tabloyên şehîd Avêsta Xabûr, Barîn Kobanê ku herduyan di Berxwedana Serdemê de li dijî artêşa tirkî ya dagîrker li ber xwe da û şehîd bûn, nîşan dan.

Di heman demê de tabloyan balê dikişînin ser darên zeytûnan ku nîşana aştiyê û şahidên hovîtiya artêşa tirkî ne, hatin nîşandan.

Têkildarî mijarê serokê beşa Hûnerên Bedew ya Zanîgaha Rojava Xalid Fetah, diyar kir ku çalakiya hatî organîzekirin, bi pêmana salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê ye.

Xalid Fetah da zanîn ku şervanan bi çekên xwe parastina erdê kir, lê ew bi tablo û rengan berxwedan û têkoşîna nan rave dikin.

Fetah ev li gotina xwe zêde kir: "Ev tablo berî mehekê hatine amadekirin. Ji 4 tabloyên zeytî, 4



avî, 4 reş û spî pêk tên û ji aliyê xwendekarên qonaxa seretayî, amadeyî û navî ve hatine amadekirin."

Xwendekara bi navê Solîn Osê ku ew jî beşdar bûye, da zanîn ku çalakî bi pêmana salvegera dagîrkirina Efrînê ye û got, "Şêwazên têkoşînê cuda ne û ne bi çekan tenê ve girêdayî. Em jî bi rîş û qelemê têkoşîna xwe didin der."

Tabloyên Solînê balê dikişînin ser libên zeytûnan û cudayiya rengên wan dike û ev li axaftina

xwe zêde kir: "Balê dikişînin ser êrişên artêşa tirkî ya dagîrker yên ser Efrînê ka libên zeytûnan ji ber topbaranê çawa ji hev belav bûne."

ANHA

Bangewazî

Sîpan Şînda

Di nivîsa heftiya bûrî de me qala hewldanên rewşenbîr, nivîskar, dilxwaz ango xemxur û hezkiriyên zimanê Kurdî, ji bû Kurdî li Bakûrê Kurdistanê bibe zimanê fermî û perwerdehiyê kiribû. Ev hewldan hêj didomin û Kurd ji bû zimanê xwe bê veder di nava bizavê de ne. Mixabin şixwilê Kurdan ne hêsaniye. Lê her çi dibe bila bibe divê Kurd ji ya xwe neyên xwar û fermîbûyîna zimanê xwe û mafê perwerdehiyê yê bi zimanê zigmakî bê veder biparêzin û vê daxwaza xwe li hemî qadan bînin ziman, divê pêlên vê daxwazê hingî roja paştir e mezintir bikin.

Mijareke û herweha pirsgirêkeke din ya zimanê Kurdî jê, bi taybetî li bakûrê Kurdistanê û li Ewropa, di nivîsê de nebûna yekdest ya Kurdî ye. Jiber ku em bê dewletin û sazîbûyîn di nava me de nîne, mixabin me heta niha ji nekariye em zimanê xwe di warê nivîsê de bikin yekdest û rêgezên nivîsê bidin rûniştandin. Piştî salên 1990'î li Bakûr gelek kesan rêzimana Kurdî nivîsîn. Lê mixabin ev xebatên henê her takekesî man û xebatek berfireh ya ji bûna zimanê nivîsê bibe yekdest nehat kirin. Her yekê devokê xwe da pêş û got ya min rast e. Lê mixabin di van xebatan de nemir Celadet Alî Bedirxan û xebatên wî ji nedîtî ve hatin û ew bingehê xurt yê wî ji bû zimanê Kurdî danî li ber çavan nehat girtin. Ewî ne tenê bingehê rêzimanê danî, herweha ewî bingehê nivîsê û zimanekî yekdest ji danî ji bo me. Ew xebata wî li ser zimanê Kurdî kirî, tekoşîn û keft û lefta wî ji bû zimanê Kurdî dayî bê goman bê hempa ye. Ew zimanê ku wî di Hawarê de bikar anî, zimanekî yekdest û rûniştiye. Ewî çi devok nedane pêş, wî bi Kurdiyek netewî nivîsiye û pêşkêşî me kiriye. Bila xelet neyê fêmkirin, ne ku ez ked û xebatên ku li ser rêzimanê hatîne kirîn kiçik dibînim, na. Bêgoman ez rêzê ji wan xebatan re digirim. Divê her tim xebat li ser zimên bêne kirin da ku zimanê me pêşve biçe. Lê heke wan kesên ku xebat li ser zimanî kirîn zimanê Hawarê esas bigirtan û li ser temelê Hawarê xebatên xwe bikiribiyan, niha ev pirsgirêkên di nivîsê de jî sedê 90 safî bibûn. Jiber ku zimanê Hawarê him gelekî dewlemende û him ji gelekî bi rêkûpêk e. Zimanekî xwezayî ye û bi hoštayî haitye nivîsandin. Dema mirov dixwîne, mirov dibîne ku zimaên Hawarê zimanekî herikbare û mirov jê têr nabe. Tevî derfetên teng ji ew karekî bêhempa ye. Lê gelo çire em vê xebata hinde girangiha û bi zehmetî hatî kirin ji nedîtî ve tên û em zimanê xwe li gorî zimanê Hawarê yekdest nakin? Ev tiştekî gelekî girîng e ji bo me. Heke em li ser temelê Hawarê binivîsin, wê pirsgirêkên ne yekdestiya Kurdî bi giranî ji halê rabin û peywendiya di navbera her çar perçên Kurdistanê de ji wê rihettir bê danîn. Jiber ku di zimanê Hawarê de ev li ber çava hatiye girtin. Dema yekî Başûrî ji Hawarê dixwîne fêm dike, yekî Rojhilatî ji, yekî Rojavayî ji û yekî Bakûrî ji. Ev ji bû Kurdan û Kurdî gelekî girîng e. Jiber wê ez bangewaziyê li hemî nivîskar, akademîsyen, weşanxane, çapxane û kesên li ser zimên dixebitin dikim ku li ser vê mijarê bisekinin, xebatek bê kirin û li ser temelê zimanê Hawarê nivîsandina Kurdî bê sererastkirin da ku bibe yekdest. Hêviya min ew e ku ev bangewazî ji nedîtî ve neyê dîtin û herkes rojek zû di vî warî de bikeve di nava bizavê de û Hawarê ji nû ve bixwîne.

21`ê Adarê roja vejîn û azadiya kurdan e

Darîn Silê/Qamişlo

Ji ber ku gelê Kurd 21 Adarê wek vejîn dibîne, her sal li seransrê Kurdistanê gelê Kurd cejna newrozê bi girseyî pîroz dike. Rêveberê Saziya Malbatên Şehîdan Îsam Îbrahîm dîyar kir ku Newroza 2021ê bi serkeftina Garê dest pê kir û wê bi azadiya rêber Apo bi dawî bibe.

Îsam Îbrahîm li ser giringiya newrozê wiha axivî: "Em bi rihê berxwedana Garê, cejna newrozê di serî de li rêber Abdullah Ocelan û tevayiya gelê xwe pîroz dikin. Wek em dizanin 21`ê Adarê dîrokek wê ya pir girîn û bi wate heye. Dema Kawayê Hesinkar li çiyayê

kurdistanê agirê newrozê pêxist, ew despêka serhildanê bû û li hember dijmin berxwedana herî mezin bû. Ji wê demê de gelê kurd li ser piya ye, heta gihîşte fîkir û felsefeya rêber Apo. Ev felsefe ji bo berxwedanê wateyek nû da jiyanê û hişt ku vîna kurdan xurt bibe. Heman demê leheng derketin, yek ji wan jî Mezlûm Dogan bû ku pêşengîya berxwedanê kir. Wê demê agirê newrozê bi canê xwe nûjen kir

û ji cîhanê re eşkere kir ku gelê kurd xwediyê berxwedanê ne. "

Îsam Îbrahîm axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Piştî şoreşa rojava, em ketin asteke nû de. Herwiha keç û xortên me jî di qadên şer de li hember dijmin têkoşîn dikin. Em bi hêvî ne sala 2021ê bibe azadiya rêber Abdullah Ocelan û bibe sala serkeftina gelê kurd."

Jimara nexweşên koronayê zêde dibe

Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilata Sûriyê da xuyakirin ku jimara pêketiyên vîrûsa korona zêde bûye û bang li welatiyan kir ku bi tedbîrên ji bo pêşîgirtina li vîrûsa korona girêdayî bin.

Jimara pêketiyên vîrûsa koronayê (Covid_19) li bakur û rojhilata Sûriyê di demên dawî de zêde bûye. Li ser mijarê Desteya Tenduristiyê roja Çarşemê ragihand ku 45 kesên din bi koronayê ketine û 5 kes jî mirine. Bi vî awayî jimara pêketiyên vîrûsa korona li bakur û rojhilata Sûriyê gihîşt 8 hezar û 900î. Ji wan 346 kes mirine û hezar û 259 kes baş bûne. Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser Ciwan Mistefa piştrast kir ku jimara kesên ji ber korona mirîn û pêketiyên wê li herêmê zêde bûne.

Ciwan Mistefa got, divê welatî bi tedbîrên pêşîgirtinê li vîrûsa korona girêdayî bin û maskan bi kar bînin. Bi taybetî meha Adarê. Lewre gelek çalakî tê de tên kirin.

Ciwan Mistefa herwiha got, eger pêketiyên korona zêdebûna xwe bidomîne, dibe ku rewşa qedexeya gişтî yan qismî di rojên bê de pêk were. Heta niha ti rêxistinên tenduristiya cîhanî ji bo anîna dermanan ji bakur û rojhilata Sûriyê re ti gav neavêtine. Tevî ku Desteya Tenduristiyê têkildarî wê mijarê bang li gelek rêxistinên tenduristiyê kir.

ANHA

Klînîkên Gel di demeke nêz de vedibin

Navenda Nûça/Qamişlo

Bi armanca alîkarî û xizmeta gel ji aliyê tenduristiyê ve, yekîtiyên girêdayî saziyên civaka sîvîl yên bajarê Qamişlo, amadekariya vekirina klînîkên gel dikin.

Ji bo alîkariya gel bi pêşengiya yekîtiyên bijîşkan, dermanfiroş, bazirgan, cotkar, parêzer û pîşesazan projeya klînîkên gel hat destpêkirin. Ev proje ji 10 klînîkan (klînîka neurolojî hestî, diran, jin û zarokan û hwd.) pêk tê. Di projeyê de herwiha beşa dermanxane, tehlîla xwînê û fîlman jî hene. Beşa venerîna hestî, neurolojîk, diran, jin û zarokan rojane wê rojane vekirî bin, lê ye din wê hefteyê du rojan vekirî bin. Ev klînîk ji bo venerînê ne tedawî li wan nayê kirin. Ev Klînîkên Gel li cem Cisrê Bişêriyê ne.

Rêveberê Klînîkên Gel D. Fîraz Tîşê derbarê mijarê de ev agahî dan: "Li bijîşkan rexneyên weke "alîkariya gelê xwe nakin" dihatin kirin. Ji ber wê me ev proja pêşniyar kir û hat qebûlkirin. Armanca me ji vekirina van klînîkan hem xizmeta gel bê kirin, hem bi bihayekî ji yê bijîşkên taybet kêmtir venêrîna nexweşan bê kirin. Pergala xabata klînîkan jî wiha ye: Ji 8ê sibehê heta 2yê nîvro karê venêrînê wê dewam bike. Her pêdiviya li gel bijîşkên taybet heyî, wê li klînîkên gel jî hebin û di demeke nêzîk de jî wê ev klînîk bên vekirin."

Fîraz Tîşê axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di mijara peydakirina derman û amûrên bijîşkî de Heyva Sora Kurdî, Debwa Hawarî ya Leşkerî û Rêxistinên Mirovî hinekî alîkariya me kirin. Bihayê venerînê nîvê bihayê

bijîşkên taybet e û kilînîk wê ji her kesî re vekirî bin. Bi hêvî me Rêveberiya Xwesr û saziyên rêxistinên mirovan alîkariya me bikin. Eger alîkarî bê kirin emê heqê venêrînê nestînin. Kar û xebata vê projeyê berî 6 mehan hatiye destpêkirin. Piştî ku biqede emê gel agahdar bikin."

Xebata Kurdan li Ewropa: PENa KURD

Derwêş M. Ferho

Di nava saziyên Kurdî de PENa KURD jî ciyekî giring digre. Di vê nivîsê de mijara ew e.

Di salên destpêka 1980 de komek nivîskar/rewşenbîrên Kurd li dervayê welêt destê bi xebata avakirina PENa KURD dikin. Tê bîra min, xebata avakirinê jî bi gelek munaqeşe dibuhurt. Di 1988 de wek endam ji aliyê Civîna Giştî ya PENa Navneteweyî tê pejirandin. "Di 1990 de prosedûra avabûnê di fermiyetê de temam dibe.

Destûra PENa KURD di çarçeweya destûra PENa Nevneteweyî (1921) de hatiye amadekirin. Azadiya ramanê, wek pirekê di navbera nivîskar, rojnamevan, hunermend û wêje de di qada neteweyî û navneteweyî de xebatê dike. Di sed welatî de 149 şaxên PENa Navneteweyî hene. PENa KURD jî yak ji wan e.

PENa Navneteweyî bi saya pêkanîna Komisyona Nivîskarên di Girtîgehan de, gelek caran çalakiyên hêja dike. Dijî qedexekirina ramanê, sensûrkirina wêjeyê, astengiyên internetê, xebata rojnamevanan û hunermendan dixebite. Ev xebat tesîrê li ser raya giştî, biryarên hikûmetan, dezgehên di heman mijaran de kar dikin dike.

PENa KURD li ser wî esasî gelek caran xebatên gelekî baş, bi tesîr û encam kirine. Di hin civînên PENa Navneteweyî de raporên balkêş dan û bala temamiya saziyê kişand ser astengiyên hunermend, nivîskar, rojnamevan, rewşenbîrên Kurdistan ku di rewşa şerr de ne.

Lê gelo ev xebat têr dike û bes e? Li gor nêrîna min na. Berdewamiya xebata bi firazeke xwedî berhem kêmasiyeke e. Bê goman, di rewşa Kurd tê de meriv çiqasî kar bike têr nake. Lê dema kêmasî û qelsî xuya dikin, divê em li firaze û awayê xebata xwe binêrin. Di destûra me de çi hedef hene û çi pêk tê?

Berhemên hunerî, wêjeyî, folklorîk, bi siyaseteke nîjadparêz asteng dibin, xwediyên wan bi her awayî di bin zor û zilma nîjadparêzên rejîmên cuda de ne. Nivîskar, rojnamevan, hunermend û rewşenbîrên Kurd ne bes li welatê xwe, lê herweha li welatên xerîbiyê jî di bin tehdîd û astengiyan de ne. Biqasî misqalekê azadiya ramanê, ne di wêje, ne di çapemeniyê de, ne di huner de û ne jî di jiyana rojane de ji wan re heye. Ji nebûna derfetên aborî nalenale wan e. Sensur bûye siyaseta rejîmên welatên Kurd lê dîl. Zimanê Kurdî li Bakur/Turkiyê, Rojhilat/Îran di bin xetereke mezin de ye.

Gelo, di çerçeweya destûra xwe de PENa KURD bi çi awayî hember neheqî, zordarî, çewisandinan bertek dide? Navenda PENa Navneteweyî çawa ji bo vê yekê dike nav kar û xebatê? Bi çend şaxên PENên din yên welatên cuda re di nav têkiliyan de ye û çiqasî dikare wan ji bo vê zor û zilma li ser endam yan ne endamên xwe aktîf bike? Çi peywendî bi PENa Turk, Îranê, Iraqê û Suriyê (eger ew wek PENê li welêt nebin jî li derva wek komên nivîskar yan rojnamevan hene) danîne? Bertekên van şaxên Turk, Îranî yan Ereb çawa dinirxîne, li hember wan çawa tev digere? Sersarî, nîjadparêzî û hevkariya wan bi rayedarên dewletên wan re di nav PENa Navneteweyî de heşkere dike?

Nivîskar, rojnamevan, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd ne bes li welêt, li dervayê welêt jî bi her awayî têne tehdîdkirin. PENa Kurd bi çi awayî bertek dide? Daxuyaniyeke Kurdî di çapemeniya Kurdî de yan li ser facebookê têr dike? Yan di nav hemû şaxên PENa Navneteweyî de (yên Turk, Îranî û Ereb jî tê de) bi dosye, agahdarî û peywendiyên cuda çalak e? Têkiliyên Kurdan bi rêya komeke WhatsAppê baş û pêdivî ye. Lê gerek e ne bes pesindayin, gotinên şîrîn, gul û dil ji hev re werin şandin. Di çarçeweya destûra PENê de xebateke hê xurttir, bi berhem û darîçav divê.

KJK: Heta agahiyek ji Rêberê me bê girtin, divê her kes li qadan be

KJK'ê bang li CPT û saziyên navneteweyî kir ku bi erka xwe rabe û got: "Azadiya Rêberê me azadiya me ye. Heta ku ev rewş zelal bibe, em careke din dibêjin; heta ku agahiyeke rast ji Rêberê me bê wergirtin, divê her kes, bi taybetî jin û ciwan li qada çalakiyan bin

Daxuyaniya Koordînasyona KJK'ê têkildarî îdîayên li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê kirin daxuyaniyek da.

Daxuyaniya KJK'ê wiha ye:

"Tecrîda giran a li ser Rêber Apo roj bi roj tê şidandin. 23 sal in li zindana Îmraliyê, kiryarên li dijî mirovahiyê yên di dîrokê de li ser ti girtiyî nehatine ferzkirin, li dijî Rêberê me tên ferzkirin. Êşkence, cezayê hucreyê yê di nava tecrîdê de, qusandina por û jehrkirin, çend ji kiryarên beriya niha ne ku li dijî Rêberê me hatin kirin. Herî dawî par bi metirsiya koronayê û şewata li Îmraliyê re kiryarên li dijî Rêberê me êdî hedê xwe derbas kirin.

Dema ku gelê me bi van kiryaran hesiya, bi milyonan kesî kete alarmê û heta agahî ji Rêbertî wergirt nesekinî. Her carê Rêbertî bi berpirsyariyeke mezin gel û tevgera me sekinand, rawestand. Nûçeyên ku herî dawî 15'ê Adara 2021'ê li ser jiyana Rêberê me di çapemeniyê de hatin weşandin, sebra tevgera me, gelê me, jinan û dostên me difûrîne.

Di rewşa heyî de, bi milyonan mirov bi taybetî jî jin û gelê Kurd bi hêrseke mezin di nava fikaran de ne. Ji bilî hevdîtina lezgîn a bi Rêbertî re û axaftina yekser a Rêbertî, ti daxuyanî wê ji bo me, ji bo gelê me têrker nebe. Hesasiyeta tevgera me, jinan û gelê me ya li ser rewşa Rêberê me tê zanîn. Di vê mijarê de pêwîste sebra me neyê ceribandin, yên ku hewl didin me hînî vê rewşa Rêberê me bike yan jî rewşê normal nîşan bidin, di nava şaşitiyeke mezin de ne û divê ji bersiva vî gelî re amade bin.

Rêberê me bûye rêberekî gerdûnî ku li qada navneteweyî bi kampanyayên azadiyê xwedî lê tê derketin, bi paradîgma û fikrên xwe bûye rêberê gelan.

Kampanyayên li nava gelê Kurd û li qada navneteweyî yên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêbertî tên meşandin, êdî azadiya fîzîkî ya Rêbertî ferz dikin.

Nayê qebûlkirin ku bi nûçe û nêzîkatiyên li ser metirsiya têkildarî jiyana Rêberê me bersiv ji van daxwazên gelan re bê dayin.

Jiyan li aliyekî eger zerareke biçûk bi neynûka Rêberê me bê, divê her der bibe qada berxwedanê, bibe qada çalakiyan. Rewşên bi vî rengî rewşên welê cidî ne ku divê bi nerazîbûn û berxwedaneke mezin bersiv jê re bê dayin. Divê em destûrê nedin ku rewşên bi vî rengî ji rêzê bên nîşandan. Divê em bi çalakiyên xwe, bi berxwedana xwe vê yekê nîşanî zîhniyeta faşîst

bidin. Azadiya Rêberê me azadiya me ye. Ji ber vê yekê heta ev rewş zelal bibe, em careke din dibêjin; heta ku agahiyeke rast ji Rêberê me bê wergirtin divê kes nerehet be; di serî de jin û ciwan divê her kes çalakiyan bikin.

Di serî de CPT em bang li saziyên navneteweyî dikin ku li pêşberî vê rewşê bi erk û berpirsyariya xwe rabin. Di rewşeke berevajî de wê bi qasî hikumeta faşist a dewleta Tirk, ev sazî jî berpirsyar bin.

Ji niha û pê ve ji bilî azadiya fîzîkî ya Rêberê me divê em nêzîkatiyeke cuda qebûl nekin. Heta ku Rêberê me dîlgirtî be, wê timî metirsî li ser jiyana Rêberê me hebe. Bi ruhê berxwedanê yê meha Adarê, bi biryardariya xwe ya berxwedanê ya 8'ê Adarê, ji bo azadiya Rêbertî divê em Newrozê bi çalakiyan pêşwazî bikin."

Rojnwes

'Em xaka xwe ji dagîrkeran re nahêlin'

Lêzan EVDIKÊ/ Qamişlo

Di 18 Adarê 2018an de Efrîn ji alîyê devleta tirkî a faşîst ve, bi şêvazê ji derveyî qanûnên şer hat dagirkirin. Îsal jî di salvegera dagirkirina Efrîn de, li her deverê rojava bi meşên girseyî, gel ne razîbûna xwe da dîyarkirin.

Gelê Efrînê li hemberî vê dagirkirina bi tang û teyeran 58 rojan li berxwe dabû û her çiqasî jî mecbûrê koçberkirinê hatibin jî, bi dilê li gel Efrînê tekoşîna rizgerkirina axa xwe dikin. Li ser vê yekê Hevseroka Yekîtiya Werzîşê ya herêma Efrîn Dunya Bekir û hevseroka Yekîtiya Rewşembîrên herêma Efrînê Evêsta Îbrahîm ji mera axivî.

"DI KÊLEKA XEMGÎNIYÊ DE RIHÊ BERXWEDANÊ HEYA"

Dunya Bekir bal kişand li ser destdirêjî yên Devleta Tirkî yên li hember nirxên Efrînê û gotinên xwe wiha bi lêv kirin; "Dagîrkirina Efrînê ket sala çaran de. Salên derbasbûyî dewleta tirk ya dagîrker, bi hemû aweyan dest avêtin jinan, zarokan û nirxên Efrînê yên biha. Di wê demê de em jin ji hemû alîyan ve hertim xwedî li nirx û axa xwe derkeftin. Tişta ku li Efrinê hatî kirin, em wek jin ticar ji bîr nakin. Efrîn xaka meye û em ticar dest jê bernadin, emê vê yekê bi zarokên xwe, bi nifşê nû giş bidin fêrkirin û em nadin ji bîrkirin. Ji bo rizgarkirina Efrînê jî emê hertim bi israrbin."

Hevseroka Yekîtiya Werzîşê ya herêma Efrîn Dunya Bekir di dawiya axiftina xwe de dîyarkir ku bi rewşa Efrînê ew çiqas xemgîn jî bin, bi rihê berxwedanê wê bi serbikevin.

"JI BAJARÊ AŞÎTIYÊ EM BELAV BÛN"

Evêsta Îbrahîm jî li ser heman mijarê wiha got: "18 meha adarê ji bo me roja reş û xemgîniyê ye. Ev dîrok ne tine ji bo Efrîniyan, ji bo kurdan giş pir bi êş e. Divê ev

kiryara dijmin, ji bo me kurdan giş bibe zingil û em ticar ji bîr nekin ku em ji başarê aşîtiyê, bi hovane hatin derxistin û divê sekin ji bo me heram be, heta ku em Efrîna xwe rizgar dikin."

Evêsta di axiftina xwe de qala zehmetîyên penabertî kirin û gotinên xwe wiha bi lêv kirin; "Gelê me yê Rojava li her başarî çiqas wekhevî jiyan bikin jî, navê penaberî nexweşe û em rojane êşa vê yekê jiyan dikin. Heya ku em ne vegerin ware xwe, emê her

tim vê hestê jiyan bikin.Tişta ku me li ser pîya dihêle heskirina Efrînê û dengê berxwedan û tekoşîna jinê ye."

Evêsta Îbrahîm bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir; "her roj bi sedan jin dest ji jîyana xwe ya civakê dihêlin û tevlî YPJ'ê dibin ku xaka xwe li hember dagirkeran biparêzin. Angu jin bûye xwedî hêz û li her qadên şoreşê cî digire. Em jinên kurd giş wê dest bidin hevdu û emê xaka xwe rizgar bikin."

Li Îmralî çi dibe?

Jiyan BOZO/Qamişlo

Bi salan e Rêber APO di tecrîdeke giran û hovane de ye. Dewleta tirkî ya dagîrker nahêle parêzer û malbata wî biçin gel. Madya tirkan di van rojên dawiyê de li ser rewşa tenduristiya Rêber Apo nûçeyek belav kir. Gel jî demildest daket qadan û bertekên xwe diyar kirin. Gelo li Îmralî çi dibe? Rewşa Rêber APO çawa ye?

"DIVÊ HER KES XWE BERPIRS BIBÎNE"

Derbarê mijarê de dayîka Ş. Nûredîn Şemsêxan Gulo wiha axivî: "Ev salek e ji Rêber Apo ti agahî nayê girtin. Ji sala 2019an ve ne parêzeran hevdîtin pê re kiriye, ne jî malbatê. Ev tecrîd ne li ser Rêber Apo tenê ye, li ser gelên cîhanê tevan e. Lewre Rêber Apo ne rêberê Kurdan tenê ye, bi milyonan kes wî nûnerê xwe dibînin û li ser fikir û felsefeya wî têdikoşin. Xwesteka dewleta tirkî ya dagîrker tinekirina rêbertiya me ye. Ev tecrîd li dijî me jinan e. Çimkî Rêber Apo projeya azadiya jinê kir bingehê şoreşa xwe. Ji bo wê dewleta tirkî ya dagîker tecrîdê girantir dike. Ji ber wê heta em ji Rêbertiya xwe agahiyekê negirin

em nasekinin û emê li derdora rêbertiya xwe bin."

Şemsêxan Gulo axaftina xwe wiha qedand: "Banga min ji gelê Kurd tevî re heye, divê her kes xwe berpirs bibîne. Divê ji heft heta heftêsalî dakevin qadan û li Rêber Apo xwedî derkevin. Herwiha divê yekîtiya xwe çêkin. Çimkî emê bi yekîtiyê faşîzma dewleta tirkî ya dagîker têk binin û welatekî azad ava bikin."

"DIXWAZIN BI QUTKIRINA JI RÊBERTIYÊ ME TINE BIKIN"

Berdevka Komîteya Perwerdeyê ya Kongreya Star Bêrîvan Yûnis, jî ev nirxandin kir: "Bi salan e ev tecrî didome. Di kesayata Rêber Apo de gelê Kurd dikin hedef. Armanca wan jihevqutkirina gel û Rêbertiyê ye. Piştî têkçûna wan li Garê bûn gurê har. Ji ber tecrîda li ser Rêbertiya me giran kirin. Dixwazin vîna gelê Kurd, bi taybetî jinên berxwedêr bişkînin. Çimkî baş dizanin ku girêdana gel û Rêbertiyê di asta herî jor de ye. Ji bo wê tecrîdê giran dikin. Ji ber wê em jî dibêjin wê xewn û xeyalên we pêk neyên û hûn nikarin me ji Rêber Apo qut bikin. Di van rojên dawiyê de nûçeyên me li ser tenduristiya Rêber Apo nûçeyên ne baş bihîstin. Vê, fikarên gel bi taybetî yên jinan zêde kirin. Ji bo wê divê dewleta tirkî ya dagîrker berî gavekê rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan zelal bike û parêzerên wî bibînin."

Bêrîvan Yûnis axaftina xwe bi

van gotina bi dawî kir: "Em ji tevayiya cîhanê û komplogeran re vê dibêjin: Wê ev rewş herêmê tevê bixe nava felaketeke mezin. Çimkî gelê dûrketina ji rêbertiya xwe qebûl nake. Divê civaka navneteweyî, saziyên mafên mirovan li ser mijarê rawestin û li ser rewşa rêbetiyê agahiyeke rast bidin. Banga min ji gelê Kurd, bi taybetî jinan re heye, dixwazin bi qutkirina ji Rêbertiyê me tine bikin. Divê em li Rêberê xwe xwedî derkevin û li qadan bin heta azadiya wî ya fîzîkî pêk bînin."

Murat Karayilan: Ti kes nikare bi darê zorê gelê Kurd teslîm bigire

Murat Karayilan têkildarî polîtîkayên tundiyê yên dewleta tirkî ya dagîrker yên li Kurdistanê got "AKP-MHP bi tundiyê nikarin gelekî tine bikin. Nikarin gelê Kurd bi tundiyê teslîm bigirin."

Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Murat Karayilan di bernameya taybet ya Stêrk TV de, li ser êrişên dewleta tirkî yên li dijî gelê Kurd axivî.

Li ser pirsa "Dewleta tirkî li dijî tevgera we sîxuriyê bi rêxistin dike", Karayilan ev bersiv da:

"Ne ji bo tevgera me tenê, bêguman sîxurtî û hewldanên mêtîngeriya Tirkiyê hemû li dijî tevgera me ne, lê esas dixwaze kesayeta Kurd bişikîne. Ango gemar bike, ji Kurdîtiyê dûr bixe. Ji bo wê li ser Kurdan, li ser kesayetên Kurd gelek radiweste. Niha MÎT di vê mijarê de rêbazên cuda bi kar tîne. Berê dema binaniya yek milîs e, êrişî mala wî dikirin û digirtin. Demekê jî dikuştin. Niha wisa nake. Bi saxî dikuje. Çawa? Berê dişopînin, qeyd dikin, dokûman çêdikin. Pişt re bang lê dikin, dibin cihekî û dokûmanan nîşan didin, dixwazin teslîm bigirin, bikin sîxur."

Li ser mijara malbatên bi destê dewleta tirkî li pêşiya HDP'ê hatîn danîn jî Karayilan ev nirxandin kir:

"Ev jî qirêjiyeke şerê taybet yê dewleta tirkî ye. Lîstikeke dijmin e. Ew mirovên me ne, Kurd in, ew xapandine bi kar tînin. Mirovên belkî zarokên wan, ku li gorî me bihîstî hinek ji wan zarokên wan winda bûne, ne di nava me de ne, li gorî hinek nûçeyan; lê yên di nava me de kesî kes nerevandiye. Em tevgereke ji dil in, mirov ji dil tên beşdarî me dibin. Beşdarî me bûne. Dibêjin PKK'ê revandine. Ew bixwe hatine xapandin, lê dibêjin 'zarokên me xapandine'. Yanî rastiyê berevajî dikin. Ez careke din dixwazim bêjim; ew li wir 10 salên din jî rûnin tiştekî bi dest naxin. Lewre hevalên me yên ji wan malbatan, ew êdî ji malbatî avêtine. Hevalên me hene, min hin ji wan dîtine. Wan ew ji dayik û bavîtî avêtine."

Li ser pirsa banga we ji gelê Kurd re çi ye, Murat Karayilan ev nirxandin kir:

Em li hemberî siyaseteke qirker, mêtînger ku li ser welatê me şerê taybet û şerê psîkolojîk pir berfireh dimeşîne têkoşîn dikin. Rastiya me ji kûrahiya dîrokê tê, em rastiyekê temsîl dikin. Em edaletê temsîl dikin, edaletê dixwazin. Li gelê me neheqiyeke mezin hatiye kirin û em têkoşîna wê dimeşînin. Lê belê dijmin jî dixwaze rastiyê berevajî bike. Divê civaka me li hemberî vê hişyar be. Şerê psîkolojîk, ango şerê derew pir berfireh dimeşîne. Di asta herî jor de dimeşîne. Çapemeniya xwe hemû ji bo vê xistine meriyetê. Weke me berê got, li aliyekî dibêjin 'me qedandin', li aliyekî dibêjin 'mayîndebûna Tirkiyê'. Tiştekî welê nîne, ti meseleya mayindetiya Tirkiyeyê nîne. Em dixwazin Tirkiyeyê bikin Tirkiyeyeke demokrat, demokratîk. Ne ku dahatûya Tirkiyeyê xera bikin. Qaşo dibêjin, PKK tevî Amerîka nizanim tev kê Tirkiyeyê parçe bike. Ew jî dereweke mezin e. Tiştekî welê nîne. Em dixwazin li Tirkiyeyê aştî, demokrasiyê pêk bînin. Divê her kes vê bizane. Em hêvî dikin ku gelê me û demokrasîxwaz rastiya me baştir nas bikin. Bi taybetî li dijî şerê taybet têkoşîna gelê me pir girîng e. Gelê me di vê têkoşînê de cih bigire, hêza xwe ya civakî nîşan bide. Eger wisa bike wê êdî dawiya derewên wan were, şerê taybet wê nikaribe encamê bigire û wê têk biçe."

KCK: Eger rewşa rêber Apo neyê zelalkirin wê têkoşîna Tevgerê û gelê me cuda be

KCK: Dema mijar dibe ewlekarî, tenduristî û jiyana Rêbertiyê, gelê me jî û tevgera me jî pir hesas nêz dibin. Ji ber wê nêzîkatiyeke neyînî li hemberî Rêbertiya me wê bibe sedem ku rê û rêbazên têkoşîna me bigihîjin asteke cuda.

Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê derbarê idîayên li ser tendirustiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan yên li ser medyaya dîjîtal daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniya KCK'ê de ev xal hatin diyarkirin:

"Têkildarî tendirustî û jiyana Rêber Apo hin idîa hatine kirin. Ev idîa jî xwe dispêrin parlementerekî MHP'ê yê li Tirkiyê. Ji ber wê parêzeran bilez ji bo hevdîtina bi Rêber Apo re daxwaziya serlêdanê kir. Gelê me jî li her derê daketiye qadan. Ev nûçeya li ser Rêber Apo cidî ne û teqez divê were zelalkirin. Nêzikbûneke neyînî ya derbarê tendirustî û jiyana rêberekî gel, tê wateya qirkirina wî gelî. Li hemberî her rewşa neyînî wê gelê me û Tevgera Azadiyê wê bikarin bi her awayî bersivê bidin vî şerî.

DEWLETA TIRKÎ, CPT Û KONSEYA EWROPAYÊ BERPIRSÊN TENDIRISTÎ Û JIYANA RÊBER APO NE

Dewleta Tirkî bixwe berpirsyarê tendirustî û jiyana Rêber Apo ye. Saziyên navneteweyî yên ji bo girtiyan jî berpirsyar in. CPT û Konseya Ewropayê wê berpirsên her rewşa neyînî ya li ser tendirustî û jiyana Rêbertiya me bin. Rêber Apo gotibû her rewşa neyînî ya li ser tendirustî û jiyana min divê siyasî were dîtin. Dewleta tirkî û saziyên têkildar hişyar kiribûn. Bal kişandibû ser vî tiştî ku divê gelê me jî van hêzan berpirsyar bibîne.

DIVÊ MALBAT Û PARÊZERÊN WÎ HEVDÎTINA RÛBIRÛ BI RÊBER APO RE BIKIN

Divê ev nûçe cîdî werin nirxandin. Di nava dewlet û hêzên siyasî de gelek alî hene ku dijmintiya Rêber Apo dikin. Rayedarên dewletê bixwe bi salan berê gotibûn nikare ji wir sax derkeve û diyar kiribûn ka helwest û feraseta wan a li hemberî Rêber Apo çawa ye.

Li Îmralî tecrîdeke giran heye. Ev jî nîşan dide ka li hemberî Rêber Apo dijminatiyeke çawa dikin. Ev tecrîd di heman demê de tê wateya êrîşa ser tendirustiya Rêber Apo. Li Îmralî ne hiqûq, ne mafên mirovan û ne jî helwesta divê nîşanî girtiyan were

kirin, heye. Tekane rê maye ku divê ev tişt biqede. Ev jî azadiya Rêber Apo ye.

AGIRÊ NEWROZÊ YÊ SALA 2021'Ê DIVÊ BI PÊNGAVA AZADKIRINA RÊBERTIYÊ WERE GEŞKIRIN

Nûçeyên derbarê Îmralî de nîşan dane ku pêngava 'Dem dema azadiyê ye' di wextê de hatiye destpêkirin. Divê ji niha ve were destpêkirin û agirê Newroza 2021'an weke pêngava azadkirina Rêbertiyê were geşkirin. Gelê me yê ku li her derê Newrozê pîroz dike, divê Newrozê bikin têkoşîna azadiya Rêber Apo. Jixwe azadiya Rêber Apo ya gelê me bûye yek. Pêngava 'Dem dema azadiyê ye' ya ji bo azadkirina Rêber Apo û ya Kurdistanê divê bibe hedefa pêşî. Eger qadên Newrozê bibin qadên têkoşîna ji bo azadiya gelê Kurd û azadiya Rêber Apo wê pêşiya rewşên neyînî yên li ser Rêber Apo were girtin.

EM HIŞYARIYÊ DIDIN DESTHILATDARIYA AKP-MHP'Ê

Desthilatdariya AKP-MHP'ê di asta yekê de ji ewlekarî û tenduristiya Rêber Apo berpirsyar e. Ji ber wê em hişyariyê didin vê desthilatdariyê. Her nêzîkatiyeke neyînî ya li hemberî Rêber Apo wê bibe sedem ku rê û rêbazên têkoşîna me bigihîjin asteke cuda. Çawa ku tê zanîn dema mijar ewlekarî, tenduristî û jiyana Rêbertiyê be, gelê me jî, tevgera me jî çawa hesas in. Ji ber wê bê ku saetek jî dereng bibe, rewşa ewlekarî û tenduristiya Rêber Apo divê bi rengekî ku gelê Kurd pê bawer bike, bê zelalkirin."

FENER

Ji Garê Heya Efrînê, Şahiya Tolhildanê

Idrîs HENAN

Çiqas ne li hev e… Ancax derya tenê keştiyên xwe hembêz bike! Ew bedenê ku toztolazê lepên bermahiyên Moxol û Tataran pelçiqandiye û cih û bi cih şopên koledarî û hovîtiya xwe têde kolandiye, hîna jî li ser eniya wî qiseya hezeke bihûştwarî rêsandiye. Li ser nexşeya laşê jihevketî, keştiyên eşqê pêlan dişiqitînin û li peravên Meydankê, Ava Reş, Ziravkê, Kitix, Batmanê û çemê Avrînê singê dilsozî û wefedariyê diçikînin. Di asoyên awirên Eyn Dara, Sîros, Sem'an û dergeha dîroka mirovahiyê Duderî de alayîşa evîna Kurdekî penaber dimalînin. Li hawîrdora dariştan, zevî, beyar, pesar, çol û baxçeyên bereketê, ajoyên dirindeyên xesandî fena şevpestan baraneke reş dibarînin. Di oxira anora evîna te de, keştiyê meqsed diherifînin û ji nû ve rêwîtiya ber bi dilê te ve dibelişînin.

Sê sal, sê meh, sê roj, sê saet û sê kêlî, êdî demjimêra Bîgbênê jî nizane ka çiqas em derhembêza te bûne? Ne jî dikare bijmêre ka çiqas kêr, şûr û rimên ixanet û çetetiyê di laşê te de venandî ne? Wisa ye; dem ku zarok dûrî pesîra dayîkê be, şaneyên hingilan jî nikarin adana şêrîn hilberînin. Lê yê bi qisûr dîsa jî em in dayê..! ew ên ku hewl didin di kewareyên dilê te yê birîn de pîsiya xwe bimeyînin, wê bi rayîşa heza Mem û Zînê, Eyşa Îbê, Edûl û Derwêşan re rû bi rû bimînin. Dê ewladên ku ji paşila tava te welidîne, belageriya xwe bi neviyên Toran û Bekoyan bidin.

Dibe ku em dûr bin û ji mêtina sîngê te bê par bin, lê ew şîrê ku di damarên me de meyandî, bi xwêdana di nav zeviyan de celibkirî ye. Ti carî me baweriyek wisa ava nekiriye ku em fêrî dûrbûna te bin. Ji lew re, îroj zarokên te boştek be jî, li ser tixûbên te, ramana hebûn û tunebûna gelekî gernas dinivîsin. Eger gund, navçe, deşt, çiya û newalên te şahidê Serdema yekemîn bûn, bawer be dayê..! babelîska Serdema duyemîn ducanî û dizivire. Ne dûr e, zayîn gelek nêzîk bûye. Çendîn desî bavêjin te, te birevînin, tecawiz û qir bikin, rehên te kokdar in tu carî narizin. Berovajî; di landikên Hawar, Perse Xatûn, çiyayê Gewir û Bilbilê de hêkên berxwedaniyeke hîna dîrokê nasnekiriye hatine danîn. Bihin fire be dayê…! Îroj tola te li Garê, Xakûrkê, Şengal û Şehbayê têye hildan. Ne gengaz e rojekê volkanên te bi hev re neteqin û di rûyê dagirkeriyeke kirêt de neteqin. Dilbicî be, ev roj mîna reh û xwînê nêzîk bûye.

Rihdirêjên kurtêlxwar, efendiyên xwefiroş û bermahiyên neslekî rezîl ê bê esil dê li ber perestgeh û mezarên te serî bitewînin û sicdeya lêborînê bikin. Lê dîsa jî miraz, bendewarî û hêviyên te fermanên evîna gelekî ji axê re ye. Hêmin be dayê; çiqas pelên rezên te biweşînin, bişewitînin û bihetikînin, weke zeytûn û çinaran, çiqas kal bibin jî, em ê kesk bimînin. Hemû rê û selawatên me ber bi navenda te ne. Îorj bi milyonan di nav rûpîvana kêliyên te de nefes dikişînin û di goşeyên rûpelên te de xwe li hev digerînin ku di asoyên te de, ji ewrekî ziwa be jî, dê rondikên şahiya bendewariya toleke bê hempa bibarînin. Ji nû ve dê agirê newrozên me bejin û bala te bixemilînin dayê.

'Em Deyndarên Rêber Apo Ne'

Idrîs Henan/Şehba

Têkildarê idiayên rewşa tendirûstî ya Rêber Apo de, şêniyên Efrîn û Şehbayê daketin qadan û li hemberî van agahiyan helwesta xwe nîşan dan. Şêniyên Herêma Efrînê tekez kirin ku 'heya têkîlî bi Rêber Apo' re çênebin û di derbarê tendirustiya wî de agahiyan negirin, ew ê li kolanan bin.

"EM DILSOZÊ AZADIYA RÊBERÊ XWE NE"

Jina ji pêkhateya Ereb a ji Şehbayê Emanî Abdulah, ji bo wergirtina agahiyên di derbarê

rewşa tendirustî ya Rêber Apo de wiha got; "heya ku em agahiyan di derbarê jiyana rêberê xwe de negirin em ê çalakiyên xwe ranewestînin. Rêber Apo ji bo me hêviya azadî û xilasiyê ye. Çawa ku wî ji bo me can feda kiriye, em ê jî heya dawiyê dilsozê azadiya wî bin".

"HEMÛ FEDAYIYÊN RÊBER APO NE"

Emîne Mehmûd jî silavan li berxwedaniya Rêber Apo dike û dibêje: "dewleta faşîst a tirkiyê hewl dide ku bi rêya şidandina tecrîda li ser Rêber Apo, çerxekê bixe navbera wî û gelan de. Lê tirko nizane ku

serokatî giyaneke ku di bedena her mirovekî azadîxwaz de diherike. Ger îro nijadperestên tirkan, agahiyên nebaş di derheqê serokê me de belav dikin, dixwazin rêberê me di tenatiyê de bihêlin. Nizanin ku yê zîndankirî ewin, ne Rêber Apo ye. Heya ku em agahiyekê di derbarê tendirustiya wî de negirin, em ê bi fedayî heya kêliya dawî li gel rêberê xwe bin. Em hemû fedayiyên Rêber Apo ne".

EM ZILMA LI SER RÊBERÊ XWE QEBÛL NAKIN

Bedriye Welo jî bi bîr dixe ku ji zû ve ti agahiyên di derbarê Rêber Apo de nebihîstine û ew bi vê yekê gelek bi fikar û xemgînin û Bedriye teqez dike ku kesek nikare bi van agahiyên sexte vîna wa têk bibin û gotinên xwe wiha bi lêv dike; " Tecrîda li ser rêberê me çikas bê şidandin, biryardariya me ya intîqamê jî tûjtir bibe".

Bedriye Welo di dawiyê de dibêje; "şêniyên Efrîn û Şehbayê ti carî

zilma li ser Rêber Apo qebûl nakin. Hemû jî amade ne di oxira azadiya wî de canê xwe bibexşînin. Em baş dizanin ku rizgarkirina Efrînê bi azadkirina Rêber Apo re wê misoger bibe."

JIN Û CIWAN DÊ TECRÎDÊ BIŞKÎNIN

Dayîka Sebîhe Osman jî ku bi agahiyên têkildarî rewşa tendirustî ya Rêber Apo de bandor bûye, dilorîne û dibêje;"ma rêberê me çi kiriye ku dunya li ber kiryarên tirkiyê ewqas bê deng e? Qey ma mafê me jî nine ku rêberê me, bi azadî di nav me de bijî? Lê ji ber ku hemû jî şirîkên komploya li ser rêberê me ne, ji bo wê bêdeng mane?"

Dayîka Sebîha tekez dike ku çi dibe bila bibe ew şopa serokatiya xwe bernadin. Heya dawiyê ew ê li pabendên fikir û felsefeya wî bin û wiha got; "Îro ne tenê jina Kurd, hemû jinên cîhanê bi saya ramanên Rêber Apo xwedî perspektîfa azadiyê ne. "

Dayîka Sebîhe Osman di dawiya axiftina xwe de bi bîr tîne ku, ji her kesî bêtir jin û ciwan dêndarên

Rêber Apo ne. Ji lewre ew ê ji her kesî bêtir xwedî li azadiya wî derkevin û wê tecrîdê bişkînin.

'Emê vegerin ser xaka Zeytûnan'

Navenda Nûça/Qamişlo

18ê Adara 2018 Efrîn hat dagîrkirin. Sê sal in deweta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li Efrînê li ber çavê cîhanê sûçên dijmirovî dike. Ji bo xwedîderketina li nirxin xwe û vegera ser xaka xwe jinên Şehba berteka xwe nîşandan û banga yekîtiya Kurd kirin.

"EM BÊ ZAROKÊN XWE DIKARIN BIJÎN LÊ BÊ EFERÎN NAJÎN"

Derbarê mijarê Edûlê Mûsa Ehmed ya ji Efrînê wiha axivî: "18ê Adara 2018an bi darê zorê ji Efrînê hatin koçper kirin. Ev sê sal in em li Şehbayê dimînin. Em li vir pir zehmetiyan dikêşin. Ew xaka pîroz, qet ji mejê û dilê me qut nabe. Em hêvî û baweriya xwe qut nakin, emê vegerin. Çi dibe bila bibe emê li ber xwe bidin. Çimkî ev xak ya me ye, ti kes nikare me jê dûr bixe. Dibe ku em fêzîkî jê dûr ketibin, lê dilê me li Efrînê lê dide. Dewleta tirkî ya dagîrker xwest vîna me bişkîne, lê em zarokê çiyayê Lênûnê ne, ji wan re serî danaynin."

Edûlê Mûsa axaftina xwe bi van gotinan qedan : "Bi salan jina Kurd bi pêşengiya Arîn, Sara û Afêsteyan li ber xwe dan û dîroka lehengiyê bi xwîna xwe nîvîsan din. Ji ber wê em carekedin soz didin emê vegerin. Çimkî jibîr kirin xiyanete û em jî wê xakê ji bîrnakin. Bi çi mafî welatê me dagîr kirin. Bi sedhezaran koçber kirin. Bajar bi giştî talan kirin û xwestin me tine bikin. Lê em zarokên agir û rojê ne, ti carî serî ji wan re danaynin. Bi salane vê hovîtiyê dikin, lê nikarin me tine bikin. Em bê zarokên xwe dikarin bijîn lê bê Eferîn najîn. Emê zarokên xwe mezin bikin û fedayî xaka xwe bikin."

"DIVÊ EM YAKÎTIYA XWE AVA BIKIN"

Endama Meclisa Ehrizê Xalya Ehmed jî ev nirxandin kir: "Derketina me ji Efrînê pir biêş bû. Ji bo ku em vegerin me dest bi kar û xebatên xwe kir. Me sîstema xwe di hindirê Şehba de ava kir. Çimkî ji bo em karibin vegerin ser xaka xwe, divê em li ber xwe bidin û xwedî hêz bin. Ji ber wê me berê xwe da Şehba da em nêzî Efrînê bimînin. Çi dibe bila bibe em ji xaka xwe dûr nakevin û emê lê vegerin. Di berdela wê xakê de me bi hezran şehîd dan, bi sedhezaran koçber bûn emê çawa jê dûr bikevin. Êriş û hovitiya

wan li ser me hê didome. Lê ew nikarin vîna me bişkînin.

Xalya Ehmed axafitina xwe wiha bi dawî kir; "Me jinên Efrînê berdelên giran dan. Bi sedan jin hatin revandin û destdirêjî li wan hat kirin. Ji bo wê divê em asta têkoşîna xwe xurttir bikin. Divê her kes li hemberî vê rewşê bihêrs be û têkoşîna xwe xurt bike. Ji bo rizgarkirina Efrîn û Kurdistanê bi giştî divê em yakîtiya xwe ava bikin. Çi dibe bila bibe emê li Efrîn vegerin."

EGER NÛÇEYA ÎMRALIYÊ DEREW BE, AMADEKARIYA CÎNAYETEKÊ YE

VEYSÎ SARISOZEN

Rêbaza herî kirêt yê şerê teybet ewe ku, bi fêrkirinê bertekên gel li hember bûyeran bên tevizandin. Bi salane ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev rêbaz tê bikaranîn. Nûçeya herî dawî jî nûçeya herî talûke ye. Lewma niha derbasî asta fêrkirina nûçeya mirinê bûyiye. Armanca sereke ya vê nûçeyê tevizandina nerazîbûnan e.

Nûçeya destpêkê rê li ber nerazîbûneke mezin vedike. Lê piştre nûçe derew tê derxistin. Piştre nûçeyek din jî tê dayîn û careke din nerazîbûn pêş dikevin. Dîsa ew nûçe jî derew derdikeve. Bi demê re ev nûçe bi dehan caran dubare dibe. Nerazîbûn jî her ku diçe kêm dibin. Di nûçeya destpêkê de bi milyonan radibin ser piyan, lê bi demê re ev hejmar dibe hezar û dadikeve sed kesî.

Dewleta Tirkî bi rêbazê fêrkirina şerê derûnî amadekarîyê kuştinê dike. Asta nerazîbûnan dipîvin. Li rewşa dinyayê û welêt dinerin, li rewşa muxalefetê dinêrin û eger rewş cidî be wê kuştinê taloq dikin. Eger li beranberî vê firsendê bibînin jî wê kuştinê pêk tînin: Di serî de nûçeya mirinê radigihînin. Heta ku gel xwe amade bike û rabe ser piyan, vê carê jî nûçeya 'ne miriye' radigihînin. Careke din nerazîbûn disekinin. Piştre nûçeya 'ne kuştine, sekteya dile' an jî 'rewşa wî ya tendûristî nebaşe' radigihînin û doktorekî ku endamê MÎT'ê, derdikeve û dibêje 'rewşa nexweş başe'.Ev rewş jî dirêj dibe. Li gorî rewşê nûçeya mirinê bi mehan dewam dike.

Li Îmraliyê ev yek dibe pêk bê. Dixwazin ku vê girseya bi guman fêrî nûçeya mirinê bikin. Divê gel rasterast berê xwe bide armancekê. Kampanya ya 'divê Ocalan biaxive' divê esas bê girtin û kes guh nede daxuyaniyên devlet dide kirin. Divê bê gotin ku 'saxbûna Ocalan tenê wê bi axaftina wî eşkere bibe.' Divê her kes kampanya 'bila Ocalan biaxive' bide meşandin û milyon rabin ser piyan.

Ewlehiya Ocalan ne tenê ji bo Kurdan, ji bo paşeroya Tirkiyê jî jiyanî ye. Hewldaneke li dijî canê wî, wê Tirkiyê bike agir. Ji vê rewşê jî herî zêde wê xelkê Tirkê ku bendawariyên demokrasîyê pêra heyî û vê yeke dixwazin wê zerareke pir mezin bibînin.

Dibe ku bi kaosa vê carê sîstema faşîst ya tirkiyê ya ku 'bi hilbijartin, bi meclis û bi muxalefet' derbasî sistema faşist ya 'bê hilbijartin, bê meclis û bê muxalefet' bibe. Lewma hemî muxalefet ji bo pêşî li vê 'sûîqast' a muhtemel bigrin divê bi HDP'ê re hevkariyê bikin.

Çavkanî; rojnama Yeni Ozgur Politika